Kurmanji

Destega Nêrevaniya Malbatê

Xizmetên Civakî ya Şaredariya Bollnäs

ŞANDÊR
Şaredariya Bollnäs
Navenda Xizmetên Civakî
(Socialförvaltningen)
Telefon: 0278-257 15
Emaîl: anhorigstod@bollnas.se
Navnîşana serlêdanê: Våggatan 11
Postadress 821 42 Bollnäs
www.bollnas.se/anhorigstod

BOLLNÄS KOMMUN

Destega Nêrevaniya Malbatê li Bollnäs

Nêrevanên malbatê gelek caran hewceyê desteg an jî dilxweşbûnê ne. Dibe hewceya wan bi hinek dema ji bo xwe, bi heyameke dirêj a dilxweşbûnê, an jî bi axaftina li gel kesekî ku wan fêm bike hebe.

Destega nêrevaniya malbatê çendîn pîvanên cuda digire nav xwe ku armanc dike tiştan ji bo mirovên ku eqrebayên wan di jîyana rojane de hewceyê destegê ne hêsan bike, her çi ev hewcedarî ji ber nexweşî, nivîşkanî, pêgirtîbûna madeyê, pirsgirêkên malbatî an jî zehmetiyên ji ber kalbûnê bin.

Hûrgiliyên têkiliyê

Jimareya telefonê ya ji bo destega nêrevaniya malbatê ev e **0278- 257 15.**
Navnîşana emaîl ev e: anhorigstod@bollnas.se

Dilxweşkirin

Eger hûn hewceyê navberdayîna karên xwe yê nêrevaniyê bin, em dikarin xizmeta dilxweşkirinê pêşkêşî we bikin.

Xizmeta dilxweşkirinê dikare li mala we an jî mekanê me yê ewle û rehet ê li Våggatan 11ê bê dayîn. Xizmeta dilxweşkirinê bê pere ye û li ku derê be jî dikare navbera du saetan heya du rojan didomîne. Eger eqrebayê we li mekanê me tê xudankirin hîngê heqê ji bo xwarinê hebe.

Navenda xudankirina rojane

Navenda xudankirina rojane derfetê dide nêrevanên malbatê da ku ji peywîrên xwe bi şiklekî demborî dûr kevin û di heman demê de eqrebayên wan bi kesên din re rojeke çalak û têrdar derbas bikin. Navenda xudankirina rojane xwedî helwesteke rehetkirinê ye, li gel armanca sereke ya ku rojeke xweş û têrdar bi hemû nexweşan bide derbaskirin. Navenda xudankirina rojane li mekanê destega nêrevaniyê ya li Våggatan 11 ye.

Komên nêrevanan

Komên nêrevanan firsetê dide we ku hûn nêrevanên malbatê yên din nas bikin ku rewşa wan wek a we ye. Ew firsetê didin we ku hûn tecribeyên xwe, fikarên xwe û gotinên xwe yên jêhatîkirinê bi nêrevanên din parve bikin. Ew şansek e ji bo bi hev û du dayîna moralê, hînbûna bi hev re û wergirtina agahîyê.

Rojên kurt ên dubare

Armanca rojên kurt ên dubare ev e ku tiştan ji bo wan takekesan hêsan bike ku hewceyê xudankirinê ne da ku li malê jiyana xwe bidomînin û dayîna ximeta dilxweşkirinê ye ji bo nêrevanên wan. Cihên ji bo rojên kurt ên dubare li Ängslunda'yê hene. Ji bo serlêdana cihekê ya bo mayîneke kurt a dubare, ji kerema xwe têkilî bi reveberê xudankirinê çêkin bi jimareya 0278-250 00

Şêwirmendê me yê xudankirina malbatê Åsa Svärd dikare wan xizmetan bide:

- pêşniyar û desteg ji bo mijarên derbarê xudankirina malbatê
- axaftinên yek-bi-yek ku hûn ê şans bi dest bixin da ku fikr û ramanên xwe yên derbarê rewşa xwe li civateke aram û rehet bînin ziman.
- serlêdanên malê

Hûn dikarin xwe bigihînin şêwirmendê xudankirina malbatê bi lêgerîna jimareya 0278-257 16

Hemşîreya me ya xurifînê Marianne Sundström dikare wan xizmetan bide:

- pêşniyar
- axaftinên yek-bi-yek
- serlêdanên malê an jî eger bê xwestin hevdîtin
- têkiliya bi dabînkerên tedawîya tenduristî

Hûn dikarin xwe bigihînin hemşîreya xurifînê bi lêgerîna jimareya 0278-253 08